



Mistefa Hicrî: Îradeya
xelkê girîng e, û dibe em
pêngavên zêdetir jê re
hilgrin

»»» R:2



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (346)20-03-2019 Buha (1000) Tûmen

Desteya Nivîskaran a Rojnameya “Agirî” hatina ne-
wroza Kurdewarî li neteweya Kurd û xelkê Kurdistanê
pîroz dike. Herweha pîrozbahiya destpêkirina dubare
ya “TISHK TV” dike, ku newroza 2719’an a Kurdî bo
xelkê Kurdistanê kirin du cejn, û hêviya serkevtina
zêdetir bo vê kanala hezkirî a xelkê Kurdistanê dixwaze.

Herweha hêvî dike ku sala nû saleke pirr ji deskevt
be bo hemû xelkê Kurdistanê, û sala rizgariya hemû
neteweyên navçeyê be ji destê zulm û zordariya rejîma

Tehranê.

Ey reqîb her maye qewmê Kurdziman



Mistefa Hicrî: Îradeya xelkê girîng e, û dibe em pêngavên zêdetir jê re hilgrin



“Mistefa Hicrî” Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ derheq cejna newrozê peyamek belav kir ku di vê peyamê de li ser yekrêzî û yekîtiya xelkê Kurdistanê bo gihîştina bi armancan pêdagirî kir.

Deqa peyamê:

Peyama newrozî ya rêzdar Mistefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ

Hewwelatîyên Hêja!

Kurdistanîyên xweragir!

Li bereberê newroza îsal de, li ser navê PDKÎ, rûyê axavtinên min li we xelkê welatparêz ê Rojhilat e, da ku ji vê riyê ve rûçikê salekê ku me derbaz kir, û salek ku li pêşberî me ye, raxim ber çavan, lê berahiyê îznê bidin min, ku pîrozbahîya xwe pêşkêşî riha pak ya hemû şehîdên riya rizgariya Kurd û Kurdistanê û malbatên wan ên ezîz bikim. Silav û pîrozbahîyên germ li wan hemû zîndanîyên siyasî ku bi sedema daxwaza mafên rewa ên Kurd li girtîgehên rejîmê de ne. Silav û pîrozbahîyên taybet li kadr û pêşmerge û endam û alîgirên PDKÎ ku di sala 1397-an de, roleke baş listin, di xebata li dijî Komara Îslamî de. Pîrozbahî û destxweşî li wan çalakên siyasî û medenî ku di sala borî de hewl dane rêzên xelkê narazî li dijî zordarî a rejîma Komara Îslamî ji hemû tex û qatên civakê bikin yek, û bi awayekî yekgirtî dengê xwe derheq daxwazên xwe bo bidestveanîna mafê xwe ên rewa bilind bikin, û xebata bajar misoger û bihêz bikin. Xûşk û birayên hêja!

Sala borî, sala berdewamiya demsala nû ya xebata Rojhilat bû ku bi “Rasana Rojhilat” hatiye naskirin, salek ku rêkxirawa “Lêborîna Navneteweyî” wekî sala şermê bo deshilatdarên Tehranê bi nav kir, salek ku Kurdistanîyan di Rojhilat îradeya xwe bi gireva sertaserî li dijî rejîma Komara Îslamî nîşan dan, her di vê salê de bû ku hizb û hêzên Rojhilat di çarçoveya “Navenda Hevkarî” de, hewlên xwe xistin ger, da ku bi awayekî yekgirtî ber bi pêşwaziya ji guherînkariyan ve herin, salek ku siyasîyên rejîmê di cîhana derve de rastî astengiyên micid bûn, û aboriya wê bi sedema siyasîyên nerewa ên wê rejîmê li ser herifîna bû, salek ku nûnerên neteweyên bindest û beşek ji hêzên Îranî, hewlên xwe di çarçoveya “hevalbendiya bo demokrasî û yeksaniyê” xistin ger, heya ku eniyeke berfirehtir di hemberî Tehranê de saz bikin. Hemû evane û dehan mînakên din komek nîşan in, di vê derheqê de, ku Komara Îslamî berbirûyê salekê dibe, ku naçar e di hemberî dehan kêşeyên kelekebûyî de, cama jehrê vexot û “nermîşa qehremanane” yeke din ji xwe nîşan bide, û vegere ser maseya gotûbêja digel Amerîkayê. Xeynî vê yekê tu riyek ji bilî herifîna di ber dest de nîne, bi herifîna vê rejîmê jî qonaxeke nû ji jîyan û xebat di Kurdistan û Îranê de dest pê dike, her çend gotûbêja digel Amerîkayê û pejirandina wan mercên ku jê re hatiye diyarîkirin, tenê renga bikare bo heyameke kurt temenê vê rejîmê dirêj bike.

Em wek Hizba Demokrat berçavên me rohn in, û em dizanin ku di kudera guherînkariyan de me cih girtiye, û ber bi çî aqarekê pêngavan davêjin.

Ji dîtingeha me ve Komara Îslamî tenê ji aliyê civaka cîhanî ve berbirûyê metirsiyan nabe, belku çavkaniya girîng û bingeîn ku

vê rejîmê rastî jnavçûnê dike, şîyan û vîna gel e.

Yekem rawestegh kirîza siyasî ye. Komara Îslamî bi reformxwaz û binajoxwazan ve rastî herifîneke siyasî hatiye. Wateya wê ya sanahî, jînavçûna hemû wan wateyan e ku heya îro xelk pêve mijûl kirine. Hekî pêştir hevkêşe di navbera reformxwaz û binajoxwazan de bûn, lê îrorojê bera hevkêşeyan rû li xelk û nizamê ye, û bi vî awayî guhertin bi ser de hatiye. Bi watayeke din rikeberîyeke dijwar di navbera xelkê û sîstema deshilatdar de heye, ku wisa dike Komara Îslamî bibe “madorayî” a Rojhilata Navîn. Di vir de ye ku vîna gel girîng e, û dibe pêngavên zêdetir jê re bêne hilgirtin. Heman siyasî û têngîhîştin ku Hizba Demokrat di çarçoveya Rasanê de wek “pêkvegîrêdana xebata çiya û bajar” bi nav dike. Heman îrade ku hemû leyîzan dide aliyekî.

Aliyekî din mijara herifîna aboriya Îranê ye. Herifînek ku çavkanîgirtî ji destpîsiya malî, monopolkirina çavkaniyên aborî, kêmbûna şandina derve ya petrolê, xerckirina dahata welat li derve, bûdceyeke zexim bo alavên leşkerî, duqatkirina bûdceya Wezareta Îtîla’atê, navendên ayînî ên Şî’e û hêzên serkutkar e. Ew hemû di demekê de ne ku rojane em şahidê jikarketina kargehên mezin û biçûk in, û girîngtir ji wan jî nebûna sermayrêjiya navdewletî ye, ku girîngiyeke taybetî heye bo vejandina aboriya Îranê, lê bi sedema siyasî û şaş ên Komara Îslamî kompaniyên mezin ên cîhanê amade nînin ku xwe li bazara pirr ji rîsk a Îranê bidin.

Kirîza aborî hekî di Îranê de kêşeyeke mezin e, lê di Rojhilata Kurdistanê de ew kêşe duqat e. Jiber ku Komara Îslamî wekî kolonîyeke navxweyî digel Kurdistanê tevgeriyaye. Bi vê watayê ku tenê dahat jê bi dest xistiye, bi bê vê ku tu sermayedanîneke dirêjheyam tê de encam dabe. Mînaka herî berça ya vê siyasî û di pîrsa

kolberan de bi ciwanî tê xuyakirin. Hekî kolberên Kurd metirsiya jidestdana canê xwe qebûl dikin, qurbanîyê siyasî û ne ku eva çendîn dehik e ku Kurdistanê di di berejewendiya xwe de diçewisîne.

Jîngeheke din ku Komara Îslamî kiriye sîstemeke din ya necihgir, jîngeha kulturî ye. Kulturek ku Komara Îslamî bi salan e bi ser xelkê de zal kiriye, kulturek ku ya kesên çendîn sedsalî berî niha ye, lê rabûnek di hemberî vê kulturê de di qadê de ye, rabûnek ku rêberatiya wê di destên jinan û qata naverast de ye.

Eva ku di vê derheqê de, ayetullahên Tehranê daxwaz dikin, heya dîwexanên wan jî birr nake. Çawaniya derketina zarokên van kesan di medyaya civakî de nîşaneke cidî ye, ku kultura pesendkirî ya xelkê gellek cuda ye ji buhayên sîstemê.

Xelkê Kurdistanê her ji destpêkê ve, li pey wêneyê Xomeynî di heyvê de nediğerîyan, berevajî, ew ser vê bawerîyê ne, ku komek mirovên dilmezin hene ku bi hêvîdarbûnê, sermayeya herî hezkirî ya jiyana xwe gorîyê nîştîman dikin, û dibin pêşmerge û di asta herî bilind ya mirovbûnê de, canê xwe di pêxema azadiya xak û xelkê nîştîmana xwe, wate Kurdistanê de gorî dikin, û ew jî wan kesan wek çavkaniya nîrx û buhayên xwe dizanin. Kulturek ku di vê qonaxa nû de, û di Rasana Rojhilat de, hemaseyên Qereşeqel, Kosalan, Hemaseya Kirmaşan, newroza cemedaniyan û xakîpoşan, govenda ala û gireva giştî lê ket. Di nava gêjavekê de ku rêjîm tê ketiye, Rojhilata welat bi nihêrîneke geşbînane ve mijûlî hêzgirtina xwe ye.



Hêzek ku sîma û rûçikên xwe di civîna xelkê bo rêzgirtina ji zimanê dayîkê û himbêzkirina pêşmergeyên xwe, xwe derdixe. Hêzek ku bawerî bi Kurdistanê, wekî bingehe û binyata îro û siberojê dizane. Herweha her lihevkerin û hevalbendîyekê, ji kanala mafên Kurd ve dibîne. Eva ku rohn e li cem hemîyan, Rojhilat û bi giştî Kurdistanê di sta navdewletî de bi tenê ye, tenêti ne bi wateya lawazîyê, belku bi wateya vê ku, civaka cîhanî zêdetir çav li guhertinê di Tehranê de dike, û wir girîng dibîne. Lewra di vê demê de hêzên Rojhilat hewlên xwe dixin ger, ku eniya dijberîya digel Komara Îslamî berfireh bikin. Di heman demê de “Ebûbekir Me’îrûfî” û “parêzer û şehîdê jîngehê” ê wek “Şerîf Bacwer” û ew xortên ku bi nav û sirûda “Xwa weten awa key” singê xwe dikin mertal, ji birnakin.

Ya ku di dawiyê de dixwazim bas bikim vedigere ser bizava rizgarîxwaziya Rojhilata welat. Emên Kurdistanî bo heyama zêdetir ji yek sedsalî ye ku di xebateke bê rawestîyan de ne, û di vê riyê de gellek bela û şikest hatine ser rîya me. Lê îro rojê em di rawestgeheke hestiyar de dijîn, ku ew jî wisa dixwaze ku em rêzên xwe di navxwe ya Kurdistanê de bikin yek, û enîyeke bihêz û cidî di navbera xwe û Îraniyan din de ava bikin, û dengê bizava Rojhilat carek din bigehînin civaka cîhanî.

Ya ku li stûyê partiyên si-

yasî ye, fêrbûna vê rastîyê ye ku siyasî li Kurdistanê nabe bona vêdedana hevdu û xwe nêzîkkirina li ên din be. Berevajî em dibe kultura lihevkerinê rave bikin, û di dema nêzîkbûna digel ên din de, dibe ku siberoja pîrsa Kurd di bîra me de be.

Ya ku em ji Îraniyan çaverê dikin tu tiştek nîne, xeynî vê ku Îran nabe ya duh û îro be, belku dibe Îraneke din be, Îranek ku Kurdbûnê de nasnameyeke veşartî nebe, û bi awayekî fermî vê qebûl bikin. Diyar û xûya ye, ku rûberê bîrkirina giştî ya Îraniyan heya niha di navbera saza derbazbûyî û axavtinên giştî de dizivire, lê baştir ew e ku bo yek car û bo hertim bizanin ku “Ey reqîb her maye qewmê Kurdziman”. Asta navdewletî aliyekî din e ku astengiyên wê tenê bi Hizba Demokrat çareser nabin, hewce ye ku partiyên siyasî ji yek çeperî ve li vî rûberî binêrin, û hemû bi navê Kurd qise bikin. Herçend ku hêzên Kurdistanî navendek bo vî warî pêk anîne, lê hewce ye ku çalaktir û bileztir bin, bo yekxistina hemû Kurdê Rojhilat.

Bi giştî di demekê de em berev newroza 1398-an ya Rojî gavan davêjin ku çavên me hemîyan li ser navxwe ya Kurdistanê ye. Çavniherîya me ew e ku pêdagiranetir ji salên pêşîn, li hemberî birêvebirina newrozê hestiyar bin, lewra hewce ye ku xakîpoşên Rojhilat navenda bajaran bikin qada reqs û semaya cemedaniyan.

Rojek ji zîndana Diyarbekirê



Bûbê Eser

Rojek ji rojên 12`ê Îlonê bû. (Di vê rojê de leşkerên tirk di roja 12`ê Îlona 1980`î bi darbeyeke leşkerî li tirkîyê û bakurê Kurdistanê hatin ser hukm). Gardiyanê me, em derxistibûn derve ku meşê bi me bidin kirin û sirûdan bidin xwendinê. Di dema meş û xwendina sirûdan de me ji destê gardiyanê xwe gelekî lêdan dixwar. Ji ber ku ew roj roja 12`ê Îlonê bû, pêwîst bû, her tiştên wê rojê bi awayekî taybetî bihatana çekirinê.

Di nava wê meş û lêdanê de hevalekî nigê (lingê) xwe berî me avêt pêş, û gardiyan dît. Wî em dane sekinandin û li ber wî hevalî sekinî û heta jê hat, kulmek li wî da, ew ket û xwîn ji dev û pozê wî hat. Ket û ranebû, gardiyan û me got belkî mir. Loma jî piştî ketina wî, gardiyan em dane sekinandin û got:

-Qawiş rahêlin cenazê xwe û herin hundir heta ez werim.

Wî em xistin hundir û çû, em weha tê gihiştin, ew ê mizgîniyê bide yuzbaşiyê xwe da ku ew jî xelata xwe bigire. Piştî qederekê ew bi kêf û bi bazdan li gel çend gardiyanên din li qawişê vegeya, derî vekir kenîya û gazî berpîrsê qawişê kir û got:

-Berpîrs! ka wî kesê mirî bîne.

Hevalê Berpîrs li wî vegeand û got:

-Komandanê min ew kes ne mir, wî niha çavên xwe vekir.

Bi xelaskirina gotina hevalê



Berpîrs, rûçikê gardiyan tîrş û tal bû, sor û zer bû, deriyê qawişê girt û di ber xwe de got:

-Naxwe ew ne mir ha, ne mir ha, ne mir ha!

Gelekî hêrs bû bû, ji ber ku dema ew kesê girtî nemira wê yuzbaşî tu xelat neda gardiyan, loma hêrs bû û bi zîrt got:

- Têkevin rêzê ez ê qasî du-sê deqîqên din li we vegeim.

Wî derî girt û çû, di vegerê de li gel çend gardiyanên din li me vegeya û got:

- Divê ez, îro yekî ji we bikim qurbana vê roja delal.

Piştî qederekê, li gel çend gardiyanên din, bi hêrs deriyê qawişê vekir û ketin hundir. Li dora me çûn û hatin, dibû nuçe-nuça gardiyanê me. Bû kufe kufa wî, difikirî ku ji dilva xelatê dibe ku yuzbaşî, wî bişîne cihê wî yê ecemîtiyê. Weha jê dihate fêmkirin ku tîrsa wî ya herî giran ev bû, bi vê tîrsê ew di ser me de qêriya:

-Nabe, nabe, divê îro ji we yek di nava du metro paçê sipî de here mal. Eger yek ji we nere yuzbaşî wê min ji dêlva we bişîne malê.

Bi vê tîrs û xofê, wî darê xwe rakir û dest bi lêdana me kir. Bû axîn û waxîna me, bû qêrîn

û hawara me. Carna hin ji me diketin erdê, dîsa radibûn. Serê çend kesan jî me hate şikandin. Heta emirê yuzbaşî hat û gotibû, "min ew azad kir, îro têra me kes ketine, hin mirine û hin jî li ber mirinê ne".

Belê her çiqasî nava gardiyanan û yuzbaşî xweş bû jî lê dîsa ew gelekî ji wî ditirsiyan. Dema wan jî şaşî bikirana, an jî tiştê ne li gor yuzbaşî bihata dîtin, rewşa wan wê ne kêmtî ya me ba.

Her çiqas ew hatibûn azadkirin jî diviyabû li hember qenciya yuzbaşiyê xwe, wî jî tiştê bikira ku ew jî kêfxweş biba. Loma hema wî çavê xwe li nava me gerand û bi destê hevalekî me girt, derxist derve.

Piştî derketina gardiyan û heval, dengê jopa dihat ku ew li wî didin. Qederekê weha dom kir dûre bêdengiyek çêbû. Piştî wê bêdengiyê qêrîneke gelek berz ji heval hat.

Çer bû, çi bû. Me nema dizanî bû. Deriyê qawişê hate vekirin heval ji navê û berjêrtir tazî bû. Dema ew ketin hundir gardiyan bi awayekî devliken ji hevalê me re got:

-De ka bêje, min li derve çi anî serê te? Yeko yek bêje, bila hevelên te jî bi rewşa te bizanibin.

Heval dest bi axaftinê kir, ji xwe wî tiştên ku gardiyan anîbû serî negota, rewşa wî dikarîbû hîn xerabtir biba, ew dikarîbû di nava du metro paçên sibî de biçûya malê jî, loma got:

-Komûtanê min ez derxistim derve, li wir berê li min xist, dûre got: "Jina te heye" min got: "belê" wî got: "Ez binim jina te" Min got: "di oxire te de ye." Wî got, "diya te heye" min got: "belê" wî got: "Ez di diya te jî nim" min got "di emirê te de ye." Piştî van xeberdanan, wî bi alîkariya hevalê xwe pantolonê min ji min kirin, serê min berbi jêr û qûna min berbi jor hildan û jop heta taliyê rada min. Dûre ew jobê bi gû, min bi zimanê xwe dalast.

Piştî hevalê me ê girtî, li gardiyan nerî û got:

-Emirê te hate cih komandanê min.

Piştî wê bobeleta gardiyan anîbû serê wî, him gardiyan hebekî rehet bû bû û him jî yuzbaşiyê wî, dema ew bûyer bihîst kêfa wî jî hatibû, loma gardiyan êdî ne deyndarê yuzbaşî bû...

Newroz, referandoma serxwebûna Rojhilat e!



Eskender Ce'iferî

Rejîma Komara Îslamî a Îranê, tevgera partiyên Rojhilatê Kurdistanê bi hûrî dişopîne. Heta partiyeke Kurdî bikare hevrêziyê di nava refên aliyên cuda de pêk bîne, Komara Îslamî jî nîgeran e.

Newroz bûye remza şoreşê. Di dîroka hevçerx de, ti yek jî wan desthilatan ku Kurdistan dagir kirine, nexwastine merasîma Newrozê bi rengê ciddî were pêşwazîkirin. Rojhilatê Kurdistanê jî parek jî vî welatê birîndar e. Komara Îslamî, weke rejîma Pehlewî, riftarê bi Kurdan re dike û lehengên Kurdan tenê ji ber pêkanîna çalakîyekê bi dehan salan di girtîgehan de dimînin.

Aliyên siyasî ên Rojhilat, herî dawî li ser pêşwazîkirina hevpar ji Newrozê lihev hatin. Belkî ev, zengila metirsiyê be ji Komara Îslamî re. Ji Ber ku heya niha ti caran bi vî rengî, hemû partiyên nasyonalîst û komonîst ên Rojhilatê Kurdistanê li hev nêzîk nebibûn.

Piştî biryara han a pêşwaziya hevpar ji Newrozê ji aliyê partiyên Kurdî ve, tevgera mezin di nava Spaha Pasdarên Îranê de çê bûye. Ew ditirsin vî carê Rojhilatê Kurdistanê hemû hevdeng rabe ser piyan. Zanyariyên veşartî ji nava Spahê amaje dikin ku bajarên Sine, Ormiye û Kirmaşanê bûne armanca sereke a hêzên wê rêxistina terorîst. Bi vî rengî ku endamên Sipahê, di nava xelkê sivil de digerin û neyaran didin nasandin û biryar e her kesê ku behsa Newroza hevpar a aliyên Kurdî bike, bê girtin.

Ji xeynî tevgerên Spaha Pasdaran, selefî jî li hemberî nasyonalîstan tene çalakîkirin. Plana herî dawî a Îranê ew e ku derfetê bide rêxistinên tundrew da ku nasyonalîzma Kurdî di landikê de bifetisînin. Li gora zanyariyên çavkaniyeke veşartî a saziya Îstixbarat angû Îtîlaata Îranê, eger tevlihevî an jî serhildana xelkê û partiyên Rojhilat li hemberî desthilat

çê be, dibe ku ji bo dijatiya hêza Kurdan, mifah ji aliyên selefî jî were wergirtin.

Her sal, hejmarê kesên ku li Rojhilatê Kurdistanê di encama nebûna derfetên kar de dibin kolber, bilind dibe. Rêjeya kuştina kolberan, girtina Kurdan bi tometên siyasî û herwisa rêjeya darvekirina welatîyan zêde dibe. Tepisandina xelkê berfirehtir dibe lê dîsa jî xelk guh nade rejîmê. Her sal qedexetî dikeve ser pêkanîna rêwresma Newrozê lê tevî vî jî xelk cejna xwe pêk tîne û slogana partiyên xwe li dijî dîktator, hildide.

Her Newrozê, ji bo Kurdan referandomeke serxwebûnê ye ku li dijî Teheranê li hemû navçe, gund û bajarên pêk tê. Aliyên siyasî ên Rojhilatê Kurdistanê wisa dibînin ku qet li Îrana di bin desthilata Komara Îslamî de, hîlbijartîneke demokratîk û azad birêve neçûye û ew hertim hîlbijartinê baykot dikin. Li gor wan, her sal Kurd di Newrozê de biryara xwe li dijî dagirker distînin û soza xwe bi rîya şehîd û cangoriyên niştîman re nû dikin.

Niha, referandoma serxwebûna Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê tevahiya partiyên di nav Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanê Îranê ve bi rêve diçe. Her yek jî wan, sloganekê ji bo azadiya niştîman hil dide. Taktîk jî cuda ne. Lê armanca hevpar, bûye sedem da ku hemû, hevdeng, bang li neteweya Kurd bikin heya dakevin kolanan û bi reqs û dawetê, dilê dagirker bihejînin û car din jê re bejîn ku evder welatê me ye û em ji bo pêkanîna tevgeran li ser axa xwe, îznê ji ti kesekî naxwazin û Newroza me, dengê dijatiya me a li hemberî dagirker e.

Êdî çiyayên Zagrosê, hemûyan dest dane hev û ji Agirî, heya Bozê Sîna, ji Kêleşîn heya Arbaba û ji Dalaho heya Qelaçolan, dengê pêşmerge di nav keç û xortên Kurd de reng vedide û ewê bi TISHK'ê agir û rojê û bi tîrêjên dilên dayîkên şehîdan herin pêşwaziya Newrozê û zêdebarî hemû rêwşûnên tund ên ewlehî ji aliyê rejîmê ve, nêzîkatiya xelkê bi mijarê re germ e û referandoma me wê di dema xwe de birêve biçe.



Satiari - Nawroz98

Kermanshah elite
© Furd Goodarzi

Newroza Rojhelat



Azad Kurdî

Newroz yek ji sembolen neteweyî ye ku bûye beşek ji dîrok û çanda kurdî. Kurdan ji demên berê ve heta niha nerîneke taybet li ser Newrozê hebûne. Ji xeynî nûbûna sala Rojî û biharê, coş û germahiyeke taybet dide jiyana gel û vedijîne. Ji xwe mirov bi hêsanî dikare vê liv û tevgerê di hemû qadên civakê de bibîne. Gellek hewildan hebûn ku bikarin Newrozê û Kurdan ji hev dûr bikin, lê çî yek ji wan ser negirtin. Ligel ku di hinek qonaxan de kesên oldar hewil dane pîrozkirina Newrozê ji civaka Kurdî qedexe bikin, lê

nekarîn. Kurdan ji berê ve bi agir û govendê pêşwazî ji Newrozê kirine û bûye semboleke jiyana wan a netewî.

Çendîn gel li Rojhelata Navîn Newrozê bi awayên taybet û cuda bi xwe pîroz dikin. Lê ji ber jiyan û çarenivîs û bindestbûna neteweya kurd û zilm û bêdadiyên ku ji aliyê dewletên dethilatdar û dagirker li gelê kurd hatiye û tê kirin, Newroz wateyeke taybettir jî li xwe girtiye. Newroz bûye sembola jiyan û berxwedanê. Herwiha yê bûye beşeke cuda nekirî ji xebata azadîxwaziya Kurdan bona bidestveanîna mafên xwe.


Lê di nav Kurdan de jî, van salên dawî pîrozkirina cejna Newrozê li Rojhelata Kurdistanê ketiye nav qonaxeke taybettir de. Li pîraniya gund û bajarên Rojhelata Kurdistanê şahî û agirê Newrozê bi awayê ku karîbin pîroz kirine. Rejîm ji vê yekê nigeran e û sala borî li gellek gund û herêman li Kurdistanê, şahiyên Newrozê qedexe kir û îsal jî herwiha. Rêjîm taba kombûn, yekdengî û yekîtiya gelê kurd nake. Ji ber sîstema sed li sed zordar û dîktatûr ya Îranê li Rojhilata Kurdistanê, gel derfetên weke Newrozê bikar tîne bona nîshanda hêz û îradeya xwe ya azadîxwaziyê. Agir, govenda kurdî û Cemedanî jî ligel, niha bûne sembolen Newrozên Rojhilat. Taybety-mendiyên Newrozên Rojhelat ên salên bi kurtî dawî ev in:

-Peyameke eşkere ye bo rejîma serdest û deşhilatdar li Îranê ku gelê kurd teba û yekgirtî ye, ji ber ku rejîma Îslamî ya Îranê û yên berê jî qet yekgirtin û tebahiya gelê kurd nexwestine.

-Kombûn, govend û agir hilkirin ruhiye û morala gel bi hev re bihêz dike û hêvî û îradeya wan xurttir dike bona jiyan û xebatê, pirsên ku herdem cihê nigeraniya rejîma Îranê bûne.


-Bersiveke erênî ye ji aliyê gel ve bo tevgera azadîxwaziya Rojhelata Kurdistanê ku ev çend sal in hemû hêz bi hev re banga pîrozkirina Newrozê bi govend, agir û bi Cemedaniyên kurdewarî dikin. Ev yek xuyakirina îradeya bihêz a neteweyî ye ku gel bi govend, agir û cemedaniyên sembola kurdewarî nîşanî rêjîmê dide. Bi vê wateyê ku gel û partiyên beşdarî tevgera azadiyê yek ceste ne û armanca wan jî azadî û rizgarî ye.

Nerîna Lîderan



Macron:

“Ez her dem li cem gelê Kurd bûm”.



Trump:

“Dema wê hatiye ku Amerîka Gulanê wek axa Îsraîlê nas bike”.



Mike Pompeo:

“Ew şasiya Obama ya derheq Tevgera Kesk a li Îranê, em derheq Venzoêlayê dubare nakin”.



Brian H. Hook:

“Vegerandina dorpêçên li ser rejîma Îranê bûne sedem ku ew rejîm nekare afîkariya 700 milyoni Dolarî bi Hizbullahê bike”.

“Netanyahu” ji ber “Gulan”ê spasiya Trump kir

Serokwezîrê Îsraîlê, Benjamin Netanyahu ji ber helwesta wî ya derbarê herêma Gulanê de, bi navê gelê Îsraîlê spasiya Serokê Amerîkayê, Donald Trump kir.

Benjamin Netanyahu di konferansekê rojnamevanî de pêşwazî li helwesta Trump a derbarê herêma Gulanê de kir û ev helwesta wî weke pêngaveke dîrokî bi nav kir.

Netanyahu got: “Bi navê gelê Îsraîlê spasiya Serokê Amerîkayê Donald Trump dikim bo wê pêngava dîrokî ku bilindahiyên Gulanê wek axa Îsraîlê nasand.”



Serokwezîrê Îsraîlê da zanîn ku berê Serok Trump bi nasandina Orşelîmê wek paytexta Îsraîlê û veguhestina balyozxaneyê xwe bo Orşelîmê, herwiha vekişîna ji rêkevtina etomî ya bi Îranê re dîrokek taybet tomar kiriye.

Benjamin Netanyahu tekez kir, helwesta nû ya Trump a di derbarê bilindahiyên Gulanê de, pêngaveke din a dîrokî û girîng e.

Îro Serokê Amerîkayê, Donald Trump di peyamekê de ku li ser hesabê xwe yê twitterê belav kiriye, helwesta xwe ya derbarê herêma Gulanê de aşkere kir û got, êdî dema wê yekê hatiye ku Amerîka bi fermî serweriya Îsraîlê li ser bilindahiyên Gulanê nas bike.

Trump diyar kiriye ku ev pêngava Amerîkayê dê ji bo ewlehiya navçeyê giring be û tekez dike, bilindahiyên Gulanê di aliyê stratejîk û ewlehiyê de ji bo Îsraîlê gellek giring e.

Gulan herêmeke bilind û çiyayî ya li ser sînorê navbera Îsraîl û Sûriyê ye ku di şerê şeş rojî yê navbera Îsraîl û welatên erebî de, di sala 1967an de kete bin kontrola Îsraîlê û heta niha jî di bin kontrola wî welatî de ye.

Îsraîlê di sala 1981an de, Gulan weke beşek ji axa xwe nas kir, lê belê civaka navdewletî hêj jî wê herêmê weke beşek ji axa Sûriyê dibîne.

Trump: Dema wê hatiye ku Amerîka “Gulan”ê wek axa Îsraîlê nas bike



Serokê Amerîkayê, Donald Trump ragihand, êdî dema wê yekê hatiye ku Amerîka serweriya Îsraîlê li ser bilindahiyên Gulanê nas bike.

Donald Trump li ser hesabê xwe yê twitterê, derbarê çarenûsa herêma Gulanê û helwesta Amerîkayê ya di vê derbarê de peyamek belav kir.

Trump di vê peyama xwe ya twitterî de dibêje, piştî 52 salan êdî dema wê yekê hatiye ku Amerîka bi fermî serweriya temam a Îsraîlê li ser bilindahiyên Gulanê nas bike.

Trump diyar kiriye ku ev pêngava Amerîkayê dê ji bo ewlehiya navçeyê giring be û tekez dike, bilindahiyên Gulanê di aliyê stratejîk û ewlehiyê de ji bo Îsraîlê gellek giring e.

Newroz hêma û nîşana neteweyî a Kurd



Cemal Fethî

Herçend ku xeynî neteweya Kurd çend neteweyên din jî hene ku cîranên Kurdistanê ne, û yekem roja buharê dîkin cejn, û bi hilkirina agir û mera-simên taybet bi xwe vê rojê pîroz dîkin, eva nahê vê wat-eyê ku newroz hêma û nîşana neteweyî a van neteweyane jî, yan jî pêwendiyê rasterast di-gel dîroka van neteweyan heye û beşek ji dîroka wan e, belku li gora belgeyên dîrokî û her-weha hêma û amajeyan, yekem netewe ye ku di Rojhilata Navîn de newroz wekî cejnek û beşeke pîroz ji hêmaya neteweyî a xwe çav lê kirine, û ew neteweya bûye ku di navçeyên çiyayî ên Zagrosê û Turusê jiyan kiriye, ku ew netewe, neteweya Kurd e. Jiber ku çawanî û şewaza jiyana Kurd bi sedema rewşa wî cihî ku tê de jiyan kiriye, bûye sedem ku hertim rêz ji jîngeh û xwezaya ku tê de jiyan kiriye bigre. Wate Kurd her tiştê ku qazanc gehandibê, li cem wê pîroz e, û rêz jê re daniye, û xwezaya Kurdistanê yek ji wan tiştan e ku li cem kesê Kurd pîroz bûye.

Neteweya Kurd bi sedema çiyayîbûna Kurdistanê, çavkaniya herî serekî ya dahata wê, li ser çandiniyê û ajeldariyê bûye, û mana vê neteweyê rasterast û nerasterast pêwendiya wê bi xweza û jîngehê ve hebûye, wate her demekê xweza rewşa wê di ciyê xwe de bû, û dahateke baş bo Kurd û Kurdistanê destber kiriye, û Kurd jî wek xwezaya xwe vegeşiyaye, û jiyanê baş li rex jîngeha çiyayî û kesk derbaz kiriye, û berevajiyê vê rewşê, jiyana rûniştîyên Kurdistanê, rû li nexweşiyê kiriye. Ku ew rewş bi sedema bicîbûna rewşa he-wayê Kurdistanê kêmtir jiyan kiriye, û Kurd ku hemû salekê



newroz wekî boneyeke pîroz hesibandîye, ew yek vedigere ser vê ku newroz destpêka serhildan û vegeşîna jîngeh û xwezaya Kurdistanê ye, ku man û nemana Kurd e jî.

Destpêka pîrozkirina newrozê ji aliyê Kurdan ve vedigere ser warê wê yê aborî, lê li ber vê ku, ne tenê her Kurd, belku geşe û pêşkevîna hemû neteweyekê vedigere ser vegeşîna biyavê aborî û pêşkevîna vî warê aborî, lê di hizirîna mirovê Kurd de, newroz deqeke heta hetayî ye û wekî nîşaneke neteweyî pênase jê re hatiye kirin, û ew pênaseya jî heya radeyekê girîngî pê hatiye dan, ku dijminên Kurd bi hezaran salî ye di pîlandarêtina vê de ne, ku çewtekariyan bikin, yan vê ji Kurd bistînin, jiber ku newroz herçend ku bo neteweyên cîranê Kurd, tenê zindîbûna xwezayê ye, lê ji bo Kurd xeynî vê yekê, jîngeh beşeke têkel-kirî digel hest û nesta wê ye, û dîroka çend hezar salî ya vê nîştîmanê ye jî.

Di her yek ji beşên Kurdistanê ku di warê erdnîgarî de ji hev hatine veqetandin, newroz nîşaneke hevpar ya her çar parçeyên Kurdistanê ye, û di her yek ji beşên Kurdistanê di yekem roja buharê de cejn û şahiyê bi rê ve dibin, ku ew cejn û şahiya bas ji dîrokeke

kevn û neteweyekê herman dike, ku bi hezaran sal e serbarê hemû serkut û komkujiyan e, û dijmin nekariye nîşanên neteweyî jê zewt bike.

Herçend ku neteweyên serdest ên xeyrî Kurd jî bi armanca çewtekirin û dizîna nîşanên neteweyî, rasat di roja newrozê de newrozê bi bîr tînin, lê bibîranîna newrozê bo neteweya Kurd wekî mertalekê ye ku di hemberî wan hemû çewtekariyan û pîlanên dijmin bi kar tîne, wate newroz bo neteweya Kurd tenê yekem roja buharê nîne, belku dîrokeke çend hezar salî ye, ku bi vê sedemê ve Kurd digel dagîrkeran şerê man û hebûna xwe dike.

Yek ji wan parçeyên Kurdistanê ku dijminê dagîrker li hemû şewazeke serkut û çewtekariya dîrokî û çandî bona serîtewandina bi vê neteweya dîrokî mifah standîye, Rojhilata Kurdistanê ye, ku siyaseta dagîrkeriya deshîlata wê ya navendî digel hemû dagîrkerên Kurdistanê cuda ye. Jiber ku di dirêjahiya dîroka neteweya Fars de, ku serbarê wan hemû serkut û kuştarê îdî'aya vê kiriye û dike ku ew digel neteweya Kurd ji toxmekê wate Aryayî ne, lê vê îdiayê ji bilî kuştin û talana xelkê Kurdistanê, tu tiştêk û xêrek ji xelkê Kurdistanê re tunebûye, û yek ji wan

Li gora belgeyên dîrokî, Kurd yekem netewe ye ku di Rojhilata Navîn de newroz wekî cejnek û beşeke pîroz ji hêmaya neteweyî a xwe çav lê kirine, û ew neteweya bûye ku di navçeyên çiyayî ên Zagros û Turusê jiyan kiriye

boneyên neteweyî ku hertim dagîrkeran xwastine pêşiyê pê bigrin newroz e, ku berdewam wekî metirsiyekê lê nihêrî ne, îca hekî rast dibêjin û digel Kurd ji yek toxmî ne, çima dibe ku bi çavên gef û metirsiyê li newrozê binêrin, lewra hev-toxmbûn, û xizmatiya ku bi salan e deshîlatdarên neteweya serdest (fars) bangewaza wê dîkin, xeynî xapandin û çewtekariyan tu wateyeke wê nîne.

Endamên heyeta birêveberiya Newrozê a “Tengîserê” bo Îdareya Îtila`atê hatin vexandin

Endamên heyeta birêveberiya Newrozê a gundê “Tengîserê”, ji aliyê îdareya îtila`ata bajarê Sine, hatine gazîkirin.

Li gorî rapora gihîştî Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, roja borî l`ê Xaklêweyê, îdareya îtila`ata bajarê Sine, endmên heyeta birêveberiya rêûresima Newrozê a gundê “Tengîrserê” gazî kirine, û gef li wan xwarine.

Çavkaniyeke agehdar di vê derheqê de, ji Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re, ragehandiye ku, îdareya îtila`ata bajarê Sine, endamên heyeta birêveberiya merasima Newrozê a gundê “Tengîser”, yên bi navên “Mîzam Îbrahîmî, Teymûr Ajdax, Azad Veysî, Xerîb Qadîrî, Jiyan Mîrî û Ferheng Eyûzî” bo vê navenda hikûmetî vexwandine.

Li gorî gotina vê çavkaniya agehdar, hêzên îtila`atê, ji endamên heyeta birêveberiya rêûresima Newrozê ya gundê, “Tengîserê” re ragehandine ku, di wî gundi de nabe, rêûresma Newrozê bêne li-darixistin, û herwisa ev daxwazkariya ji aliyê heyeta birêveberiya rêûresima Newrozê ya vî gundî hatiye retkirin.



Herwisa vê çavkaniyê daye xuyakirin ku, hêzên îtila`atê piştî demjmêrekê lêpîrsîn, li endamên heyeta birêveberiya Newrozê a gundê “Tengîserê”, gef ji wan xwerine ku, hekî bi her awayî di vê derheqê de çalakîyan encam bidin, wê digel yasayên dadgehê rûbirû bin.

Ji aliyekî din ve, çend rojan berî niha, îdareya îtila`ata bajarê Sine, sê hevvelatîyên xelkê gundê “Tengîser” yên bi navên “Ferheng Eyûzî, Mislêm Se`îdpûr û Muhsên Muradî” bo vê îdareyî vexwandine, û gef li wan xwerine ku, nabe bi tu awayî rêûresma Newrozê bi rê ve bibin.

Rêûresma Newrozê hemû salê, li gundê “Tengîserê bi rê ve diçe, û yek ji mezintirîn rêûrsmên Newrozê yên li Kurdistanê tê hesabkirin û piraniya xelkê deverên Kurdistanê jî, di vê rêûresmê de beşdar dibin.

Hêzên îtila`atê li hemberî lidarxistina merasima newrozê berdewam astengiyan çê

Ajansa Kurdpa: Tevî vê ku hêzên îtila`atê bo xelkê Kurdistanê astengiyan çê dikin da ku rêûresima newrozê bi rê ve nebin, lê rûniştîyên gundê “Del” a girêdayê bajarê Merîwanê, rêûresima cejna newrozê lidarxistin.

Li gorî rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, di çend rojên borî de, hêzên îtila`atê bo xelkê gundê “Del” a girêdayê bajarê Merîwanê bo lidarxistina merasima newrozê astengî çê dikirin, lê tevî wan hemû givaş û astengiyan, hevvelatîyên wî gundî biryar dabûn ku wê merasimê lidar bixînin.

Li gorî çavkaniyeke agehdar ku, ji Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragehandiye ku, di çend rojên borî de, hêzên îtila`atê bo xelkê gundê “Del” a girêdayê bajarê Merîwanê bo pêşgirtin li lidarxistina merasima newrozê gef li wan xwarbûn.

Li gorî vê çavkaniyê, Şêvra gundê “Del” a girêdayê bajarê Merîwanê, bi sebeba givaşên îdareya Îtila`ata bajêr, bi weşandina daxuyaniyekê, rêûresima newrozê di wî gundi de betal kirin, û ew daxwazkariya jî, ji aliyê rûniştîyên wî gundî ve hate ret kirin.

Her di vê derheqê de, bi sedema givaşên hêzên îtila`atê bo ser xelkên bajarê “Melekşahî” a girêdayê parêzgeha Îlamê, cejna newrozê ya wî bajarî jî, hate hilveşandin.

Hêzên Întizamî û îtila`atê êrîşî ser cihê lidarxistina cejna newrozê kirin û dest bi ser hemî alavên wê rêûresmê de girtin.



Werger û wate

Herêman Osman

“Werger û Wate – Lêkolîneke Watesazî”, navnîşana nameyeke masterê ye ku Perwîn Osman di sala 2008an de pêşkêşî Fakulteya Ziman a Zanîngeha Koyê li Başûrê Kurdistanê kir.

Lêkolînvana Kurd Perwîn Osman asta watesazî di karê wergerê de kiriye hîm û binemaya karê xwe. Naveroka lêkolînê çand û zimanê rojane û tekstên Erebi ne yên ku ji bo zimanê Kurdî hatine wergerandin. Rêbaza lêkolînê jî zimanî û wesfî ye û teoriyên wergerê jî beşek in ji vê rêbazê, yanî wergera hevok û tekstan li gor hevberbûna wateyî ji zimanê çavkanî (Erebî) ji bo zimanê armanc (Kurdî.) Mastername ji çar beşan pêk tê:

Beşa Yekem

Di vê beşê de behsa têgih û pênaseya wergerê û têgiha hevberbûn û stratejî û îdeolojiya wergerê û çend teoriyên zimanî ji bo wegerê tê kirin. Herwiha çend pirsgerêkên wergerê li ser astên (fonolojî, morfolojî û sentaksê) tên gengeşekirin.

Peyva wergerê di zimanê Ingilîzî de (Translation) e ku tê wateya şîrovekirin û lêkdanê û (tercime) pêşî ji (tercumî) ya Aramî hatiye wergirtin û di dema xwe de ji bo ravekirina (Pirtûka Pîroz) dihat bikaranîn. Lêkolînvana çend pênaseyên wergerê ku ziman-zanan kirine, nîşan dide. Pira-niya wan teqez dikin ku werger guhastina naverok û şêwaza tekstê ji zimanê jêder ji bo zimanê armanc bi awayekî zela e. Bi gotineke din dîtina û şîrovekirina wateyê, ne peyvê, wek bingeha wergerê dibînin. Lewra lêkolînvana behsa sê cureyên wateyê dide:

Wateya Watesazî: Lêhûrbûn e li wate û tiştên amajepêkirî ku cudahiya wan di hevwaterî û hevbêjiyê de derdikeve.

Wateya derdor û derdora zerfî: Ev jî têtildarî derdor û helwesteke taybet di wergerê de ye.


Wateya tekstê: Ev wate jî hevok û regez û pêkhateyên girêdayî nav teskta wergerandî li xwe digire.

Paşê lêkolînvana hewl dide pênaseyeke bidestxistî ji bo wergerê pêşkêş bike li wê gorê ku werger proseyeke afirandinê ye û dinivîse: “Werger guhastina hizr û bawerî û şêwaz û zanyariyan e, ji bo gihandina wate û dîtina nêzîktirîn hevber bi mebesta derbirîna ezmûnekê derbarê cîhan û derdorê di navbera zimanê çavkanî û zimanê armanc de, li gor ferhenga zimanî û kultûrî, çi bi şêweya devkî yan nivîskî be.”

Herwiha lêkolînvana wergera devkî bi şêweya (rasterast, li pey hev û vedîtî) û wergera nivîskî bi şêweya (peyv bi peyv, wateyî, ravekarî, afirandin û kurtkirin) ji hev cuda dike. Dûre lêkoler amaje dide çend teoriyên zimanî li ba De Saussure û F. Fyodorov li ser wergerê û di teoriya De Saussure de behsa wergera asoyî û stûnî dike.

Li ba Fyodorov jî tekeziyê li ser wergerê wek kirdeyeke zimanî û zanistîbûna wergerê dike. Herwiha di stratejiya wergerê de amaje dide stratejiya guhastin û guherînê, ku werger cureke ji ravekirina tekstê û dîtina pêwendî û hevwateriyê di navbera du tekst an çend tekstan de, lewra divê wergêr meseleya guhastina wate û şêwaz û dariştina tekstê cidî bigire û stratejiyekê li ser astên (peyv û têgih, hevok û metinê) bide meşandin. Diyar e lêkolînvana li vir mînakên pratîk ji bo her yekê ji van astan tîne. Paşê behsa têgiha hevberbûnê di wergerê û cureyên wê de (ruxsar, erkî û dînamîkî) dike.

Her di vê beşê de rêyên serketina wergêr di karê wergerê de nîşan dide, wek: (karîna du zimanî, jîrekiya şîrovekarî, jîrekiya nivîsandinê, karîna têgihdan û têgihiştina wergir.) Paşê behsa îdeolojiya wergerê dike ku karekî îdeolojîk e û ji bo vê jî



mînaka binemaya (babet û nûçe) di dema wergerê de tîne ku dema wergêrek dinivîse: “Amerîka bi-hêztirîn welatê cîhanê ye” lê nanivîse “Bihêztirîn welatê cîhanê Amerîka ye” tekeziyê li ser navê “Amerîkayê” dike. Her di beşa yekem de lêkoler bi mînakên behsa pirsgerêk û arîşeyên wergerê li ser astên (fonolojî, morfolojî û sentaksê) dike.

Beşa Duyem

Beşa duyem dabaşa “Wate û cureyên wergerê” dike. Lêkolînvana Kurd Perwîn Osman pêşî behsa têgiha wate û regezên wê dike, têtikiliya wateyê bi ziman û derveyî ziman şîrove dike û regezên wateyê (tişt, bûyer, sîfet û têtikiliyan) diyar dike. Paşê amaje dide şîrovekirina wateya peyv û hevokan û li ber hinek teoriyên wateyî ji bo hevokê radiweste, wek: (Teoriya Katz û Fodor li ser hevokê, teoriya Fillmore li ser hevok û rêzimana rewşê), paşê berê xwe dide bîrdoziyên wateyê: (Teoriya amajekirinê, hoşekî, reftarî, şîrovekirin û bikaranînê) û hevdem teoriya (berhemana û guhastinê) ya Chomsky li ser wergerê gengeşe dike. Di vê beşê de, Perwîn Osman qala sê teoriyên ziman li ser wergerê dike:

Yekem: Cureyên wergerê li ba Catford

Duyem: Cureyên wergerê li ba Jacobsen

Sêyem: Cureyên wergerê li ba Newmark

Dûre vekoler behsa cure û rêzbazên wergerê yên (devkî û nivîskî) dike û rêbaza (peyv bi peyv) wek kevntirîn û xirabtirîn cureya wergerê dibîne. Ew gotineke Atîn Dulî tîne ku dibêje: “Nabe wergêr wek koleyekî dilsoz be ji bo teksta çavkanî, lê divê ji wergera peyv bi peyv dûr keve”, diyar e piraniya pisporan vê cureya wergerê wek wergera tekstê û jinavbirin û têtikdana armanca wergerê bi nav dikin.

Di wergera wateyî de jî vekoler girîngiya vê cureya wergerê ku wek belavtirîn û baştirîn cure tê hejmartin wesf dike. Çimkî bi awayekî zanistî wateya teksta zimanê çavkanî diparêze. Di derbarê wergera dahênanî de, vekoler amaje dide girîngiya vê cureyê jî ku pêwîst e wergêr bi awayekî hûrbîn agahdarî babet û nivîskarê tekstê be û behre û şiyana xwe ya afirandinê di wergerê de nîşan bide.

Paşê di warên edebiyat û siyasî û civaknasî de mînakên wergera ji Erebi bo Kurdî tîne, di edebiyatê de mînaka romana (Pîremêr û Derya) ku Şêrko Bêkes sala 1982an wergerandibû Kurdî tîne û çend hewldanên pratîk li ser wê cîbicî dike.

Di dawî de jî lêkoler ji bilî ferhengokekê ji bo têgihên bikarhatî, bi neh xalan encamên nameya xwe nîşan dide...

Dom heye

Zimanê Kurdî

Li vir, (kengî) têgeha pirsîyariyê bi xwe ve nagire, tenê cînavêkî nebinavkirî ye, bi wateya demê (dem, roj, çax...) hatiye . Wek: - Kengî tu hatî em ê hev bibînin (dema tu hatî) (roja tu hatî) Diyar e ev (kengî) têgeha mercê jî bi xwe ve digre.

“Kîjan” :

Cînavê “kîjan” cînavêkî lêkdayî (hevedûdanî) ye, ji pevxistina van bêjeyên xwerû (sade) (kî- ji- van- wan) pêk hatiye : - Kî ji van (mêran) pismamê te ye ?

(kîjan pismamê te ye ?)

- kî ji wan (jinan) dotmama te ye ? (kîjan dotmama te ye ?) Ev cînavê lêkdayî bi pirsîyarî cihê navên nêrza û mêzayên yekjimar û komjimar ên mirov, canewer û tiştan digre. Wek :

1- (ji van kurran) kîjan jîr e ?

- (ji van keçan) kîjan jîr e ? - (ji van kurr û keçan) kîjan jîr in ?

2- (ji wan hespan) kîjan baş e ?

- (ji wan mehînan) kîjan baş e ?

- (ji wan hesp û mehînan) kîjan baş in ?

3- (ji van kirasan) kîjan yê te ye ?

- (ji van pertûkan) kîjan ya min e ? - (ji van dar û beran) kîjan yê Reşo ne ? Li gora dem û raweyên verêşê cînavê “Kîjan” jî, weku navdêran dibe cînavêkî berverêş û nîşandekên tewandinê lê xuya dibin.

Wek : a- Raweya rasteder (bê verêş) : - Kîjan hat ?

- Kîjan hatin ? - Te kîjan xwest ? - Te kîjan xwestin

? - Kîjan baştir e ? - Kîjan baştir in ? - H.T.D.....

b- Dem û raweyên verêşê : 1- Kîjanî gul çinî ? (Vî kurrî gul çinî) - Kîjanê dar şikand ? (vê bizinê dar şikand) - Kîjanan av rijand ? (van zarokan av rijand)

2-Tu kîjanî dibînî ? (Ez wî hevalî dibînim) -Tu kîjanê dibînî ? (Ez wê hevalê dibînim)

-Tu kîjanan dibînî ?

(Ez wan hevalan dibînim) 3-Te pênûs dabû kîjanî ?

(Min pênûs dabû wî hevalî) -Te pênûs dabû kîjanê ?

(min pênûs dabû wê hevalê -Te pênûs dabû kîjanan ?

(Min pênûs dabû wan hevalan)

4- Zînê alîkariya kîjanî kir ?

(Zînê alîkariya vî xwendekarî kir) - Zînê alîkariya kîjanê kir ?

(Zînê alîkariya vê xwendekarê kir) - Zînê alîkariya kîjanan kir

? (Zînê alîkariya van xwendekaran kir)

5- Te ew gotin ji kîjanî bihîstine ?

(Min ew gotin ji wî mêrî bihîstine) -Te ew gotin ji kîjanê bi-

hîstine ? (Min ew gotin ji wê jinê bihîstine) -Te ew gotin ji

kîjanan bihîstine ? (Min ew gotin ji wan kesan bihîstine) -

H.T.D.....

Çawa nav biçûk dibin, cînavê “kîjan” jî wisan dikeve ber rêza-nên biçûkirinê : - kîjankî rojname xwend ? - kîjankê rojname xwend ? - kîjankan rojname xwend ?

“Kîjik” :

Cînavê “kîjik” jî, weku “kîjan” cînavêkî lêkdayî ye. Ev cînav ji (kî-ji-van, wan-yek) hatiye pevxistin : - (kî- ji- van- yek) : kîjik çû Amedê ? - (kî- ji- wan- yek) . kîjik ji Amedê hat ?

Ev cînavê pirsîyarî jî, di dem û raweyên verêşê de, dibe berverêş : - Tu kîjikî dibînî ? - Tu kîjikê dibînî ? - Tu kîjikan dibînî ?

Berçav e, ku di raweyên verêşê de nîşandekên (î, ê, an) gihiştine dawîya vî cînavê pirsîyariyê . Cînavê “kîjik” weku “kîjan” jî, li gora rêxistina hevokan, cihê navan, bi şêweyekî pirsîyarî digre . Anku, dibe kara, berkarê rasteder û berkarê nerasteder..... Wek : - Kîjik hat, kîjik çû ? - Te kîjik xelat kir ? - Tu Kîjikan dinasî ? - Ev pênûsa kîjikî ye ? - Te pênûs ji kîjikê standiye ?

.....

Gelek caran ev cînav jî, bêtî têgeha pirsîyariyê bikar tê : - Te kîjik xwest, ji xwe re bibe - Kîjikî alîkariya te kir, bila be

Têbînî : Gelek caran cînavên (kîjan, kîjik) sivik dibin û bi raweya “kîj” tî xebitandin .

“Çî” (Çî) :

Cînavê (çi) li hindek herêman (çî) jî bilêv dibe . Ev cînav bêjeyeke xwerû û neguhêrbar e (di hemû dem û raweyan de nayê guherîn). Wek : - Te çi dît, te çi nedît ? - Ev bêhna çi ye ? - Ev bûyerên giran, çi ne ?

Dom heye...

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (346)

Çend wêne ji merasimên newrozî li Rojhilata Kurdistanê

